KT

Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

# NETEWEPERWERÎ DI *MEM Û ZÎN*A EHMEDÊ XANÎ DE

Halil ABDÜLSEMETOĞLU

13721076

Şêwirmend

Alk. Doç. Dr. Necat KESKİN

Mêrdîn 2018

KT

Zaningeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

# NETEWEPERWERÎ DI

# *MEM Û ZÎN*A EHMEDÊ XANÎ DE

Halil ABDÜLSEMETOĞLU

13721076

Şêwirmend

Alk. Doç. Dr. Necat KESKİN

Mêrdîn 2018

# KABUL VE ONAY

Halil Abdülsemetoğlu tarafından hazırlanan “NETEWEPERWERÎ DI *MEM Û ZÎN*A XANÎ DE” adındaki çalışma Kürt dili ve Kültürü Anabilim Dalı YÜKSEK LİSANS PROJESİ olarak kabul edilmiştir

Yrd. Doç. Dr. Necat KESKİN

# KURTE

Di navbera edebiyat û netewperweriyê de tekiliyeke gelekî xurt heye. Ji bo civakek karibe bibe netewe û fikra neteweperweriyê di nav xwe de belav bike, pêdivî ji qod, xewn, ramanên hevpar hene. Bi vê egerê edebiyat di hizr û ramanên gel de hokerek bi bandor e Ji çavkaniyên manewî sûd werdigire û dikare nasnameyek giyanî saz bike. Em ê di vê xebata xwe de li ser Ehmedê Xanî û mesnewîya wî yabi navê *Mem û Zîn* bisekinin ku vê mesnewîya bêhampa li gora me wek metneke efsûnî, bandoreke mezin li ser neteweperweriya kurdî kiriye.

**Peyvên Sereke:** *Mem û Zîn*, Ehmedê Xanî, Netewe, Neteweperwerî.

# ÖZET

Edebiyat ve milliyetçilik arasında çok güçlü bir bağ vardır. Eğer bir topluluk millet olamak istiyor ve milliyetçilik fikrini kendi içinde yaymak istiyorsa, ortak kod, ortak arzu ve ortak düşüncelere ihtiyacı vardır. Edebiyat toplumun fikir ve düşünceleri üzerınde güçlü bir etkileyicidir. Toplum, soyut kaynaklardan beslenip, ortak manevi bir kimlik inşa edebilir. Bu çalışmamızda Kürtler tarafından şaheser olarak kabul edilen ve Kürt milliyetçiliği üzerinde etkisinin olduğunu düşündüğümüz Ehmedê Xanî'nin *Mem û Zîn* eseri üzerinde duracağız.

**Peyvên Sereke:** *Mem ve Zîn*, Ehmedê Xanî, Millet ve Milliyetçilik.

# PÊŞGOTIN

Herçiqas sedsal derbas dibin jî amûrên siyasetê gelek caran wek xwe dimînin. Îro du sed sal fikra netewe di pêşiya her cûrê fikrên siyasetê de ne. Şopandina fikra neteweyê ne tenê di pirtûkên siyasî û dîrokî de tên dîtin. Gava ku di dîrokê de em bi salên paş ve de diçin, edebiyat û berhemên edebiyatê dikeve pêşiya her cûre zanistê. Edebiyata rojhilat beriya sedsala 19 emîn de bi tevahî li ser helbestê dimeşiya û mijara helbestê ne tenê evîn yan jî hêmayên evînê bû. Wek ku me di vê xebatê de piştrastkiriye jî gelek mesnewîyên rojhilatê carînan bahsa siyaset û hikmetê jî dikirin. Berhema Ehmedê Xanî ya bi navê *Mem û Zîn* herçiqas bingeha xwe ji çîrokeke gelêrî sitendibe jî, naverok û fikrên vê berhemê xwe li dora fikra neteweperweriyê top kiriye. Me jî dil kir ku diyardeya netewe û netewperweriyê bê çawa di vê mesnewiyê de cih girtiyê û di kîjan kontekstê de hatiye vegotin, bînin zimên.

# NAVEROK


**KURTE ............................................................................................................ II**

**ÖZET..............................................................................................................III**

**PÊŞGOTIN ......................................................................................................IV**

**DESTPÊK ......................................................................................................... 1**

**BEŞA YEKEM**

**NETEWE Û NETEWEPERWERÎ**

1.1.NETEWE.......................................................................................................... 3

1.2.NETEWEPERWERÎ Û NASNAMEYA NETEWEYÎ.................................... 4

**BEŞA DUYEM**

**EHMEDÊ XANÎ Û MEM Û ZÎN**

2.1. EHMEDÊ *XANÎ* ............................................................................................ 6

2.2. DESTPÊKA MEM Û ZÎNÊ .............................................................................. 7

2.3. MEM Û ZÎN ..................................................................................................... 8

**ENCAM.......................................................................................................... 13**

**ÇAVKANÎ....................................................................................................... 14**

# DESTPÊK

Ramangerên ku bandor li ser avabûna romantîzma Elmanan kirin di heman katê de bûn sebep ku fikren neteweperweriyê jî derkevin holê. Têgehên ji pênasekirina neteweperweriyê re dibin bingeh ne tene ziman û nijadê, li ser têgehên mîna zimanê hevpar, xaka hevpar, diroka hevpar û çanda hevpar jî pêş ketiye. Ji bo komek an jî ji bo grûbekê, mezintirîn tehdit ew e ku ji aliye jiyana civakî ve ketina bin serweriya komeke dinê ye. Ji ber vê yekê divê her mirov xwe teslîmî îradeya giştî ya neteweya xwe bike. Divê her endamên wê komê xwe bi civakê ve girêde û berjiwendiyên komê ji yên xwe bilindtir û bi nirxtir bibîne. Neteweperwerî ji ber giringiya ku dide otoriteya neteweyî, ji pêşketina sîstemên temsîlî re jî dibe alîkar. HHelbet ji ber egoîzma neteweyî fikara kolonyalîzmê jî bi xwe re xurttir dike û dibe sebep ku neteweyên ji xwe qelstir têxe bin hukmê xwe.

Helbet neteweperwerî ji bo hemû neteweyan fenomeneke hestiyar e. Neteweperwerî dibe sebep ku bi gel re fikreke polîtîk peyda bibe. Bi saya vê yekê endamên civakê wê hev bigirin û ji bo civaka xwe wê tiştên baş pêk bînin. Lê ev yek ne ewqasî hêsan e. Di vê pêvajoyê de pêdivî bi nasnameyeke hevpar, bi serok an rêberekî karîzmatîk û berhemên edebî yên kanonîk heye ku karibe gêl ber bi hişmendiyekê ve biajo.

Rastiyek heye ku Xanî bahsa neteweperweriya kurdî dikir, berhemên xwe wek tercîh bi kurdî dinivîsand, bi kurdbûna xwe serbilind bû û nasnameya kurdî her derdixist pêş. Di sedsala ku Xanî jiyabû fikra netewedewletî derneketibû holê.[1] Ne li welêt ne jî li deverên dûrî welêt wek ewropayê mînakên bi rengî tunebûn. Hemû dewletên heyî wek Osmanî û Sefewîyan, li ser fikra dîn û xanedaniyê hatibûn avakirin. Lê Xanî wexta di mesnewiya xwe *Mem û Zîn* de ji Xwedayê xwe 'padîşeyek' dixwest di vê kontekstê de nedifikirî. Li gorî Xanî pedivî bi padişeyekî

[1] Martin van Bruinessen, 'Ehmedê Xanî'nin Mem û Zîn'i ve Kürt Milli Uyanişinin Ortaya Çikişindaki Rolü' *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, (amd: Abbas Vali), Avesta, İstanbul, 2005, r. 68.

navdar hebû bo çareserkirina pirsgirêka bêerkbûnê  û cardin pêdivî bi tifaqeke kurdewar hebû bo xurtbûnê

Di vê xebatê de em ê ewil wek têgeh li ser pênaseyên netewe û neteweperweriyê bisekinin: neteweperwerî wek têgeh çawa peyda bûye, çi karîgerî li ser metnên edebî kiriye an jî edebiyatê çi bandor li ser avabûn û pêşketina vê hizrê kiriye? Em ê li bersivên van pirsan bigerin. Paşê em ê bi taybetî li ser neteweperiya Xanî û *Mem û Zîn*ê rawestin.

*Mem û Zîn*a Ehmedê Xanî her çiqas berhemeke wêjeyî be jî bi taybetî di beşa destpêkê de bêtir li ser meseleyên siyasî sekiniye. Ew ê mînakên me yên ji bo piştrastkirinê, bêtir ji *Mem û Zîn*ê bin. Vê mesnewiya ku sê sed sal berê hatiye nivîsîn, ew ê ji bo zelalkirina hizrên Xanî yên kurdewar, mifedar be ku li gora me ev mînak hê jî reçeteya çareserkirina gelek pirsgirêkên kurdan in.

# BEŞA YEKEM

# NETEWE Û NETEWEPERWERÎ

## 1.1. NETEWE

Ji ber ku tiştên neteweyekê ava dikin û çêdikin nediyar in, pênaseya “netewe”yê hinekî girîft e. Helbet mirov amade ne ji bo tiştekî an jî hizrekê -tevî ku nizanibin ka ew tişt çi ye jî- xwe bidin kuştin an jî feda bikin. Gelek mînakên vê yeke henin. Heger ew tişt ji bo wan pîroz be mirin pir hêsan e. Li gora Jusdanîs pênasekirina neteweyê hewldaneke xeternak e. Ew qenaetên xwe yên li ser neteweyê wiha derdibire: “*Ji ber ku netewe ne heybereke şênber e bi têgehên nijadî, etnîkî û olî baş nayê famkirin*.”[2] Fikr û hizrên endamên neteweyan hevbeş in, hevdu mecbûr dikin ku têkevin qalibekî. Her çiqasî netewe di hizr û xeyalên hemwelatiyan de hebûna xwe bidomîne jî, tenê dikare xwe di jiyan û pratîkên wan yên rojane de nemir bike.

A. M. Alonso dibêje, pêvajoya avakirin û berzkirina neteweyekê bi çîrokan tê xemilandin ku ew çîrok divê hew rastiya rabirdû, niha û siberoja wî gelî vebêjin û bi karîgeriya bûyersaziyên xwe ‘bandorên heqîqî’ pêk bînin.[3] Bi wateya xwe ya berfireh netewe, mezintirîn koma civakekê ye ku armanc, berjewendî, çand, kevneşopî, rabirdû û hizra hemû endamên wê neteweyê hevpar û yek e.[4] Di pêvajoya netewebûnê de ji bo gel bi neteweya xwe bihise û fikra netewî hîs bike, pêdivî bi ziman, çand, ol û dîrokeke hevpar heye. Ji bo hişê neteweyî û hevpar peyda bibe û belav bibe jî pêdivî bi rewşenbîr, partî û saziyên leşkerî û dînî heye. Hobsbawm wexta ku qala pêvajoya keşfkirina siberojê û damezirîna neteweyê dike, qala sê rêbazên sereke dike:

---

[2] Gregory Jusdanis, *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür*, (wer: Tuncay Birkan), Metis Yayınları, İstanbul 2015, r. 228

[3] A.M. Alonso, *The efects of the truth: Re- Presentetion of the Past and the İmagining of Cominity,* Cambridge University Press 1988, r.34.

[4] Tayyar Ari, *Uluslararasi İlişkiler ve Diş Politika*, Marmara Kitap Merkezi, Bursa, 2009, r. 51.

1-Perwerdehîya birêkûpêk ya bi destê dewletê ve tê birêvebirin.

2-Peyker û xebatên hunerî yên bi gel re hişê neteweyî dide peydakirin.

3-Seremonî û merasimên gel yên girseyî.[5]

Ji van her sê xalên jorîn, em dikarin bi hêsanî fam bikin ku netewe jixweber ava nabe. Her çiqasî fikra netewperweriyê ji aliyê peyrewên vê fikrê ve derketibe holê jî heta gelê wê neteweyê neyê analîzkirin dê tu carî baş neyê famkirin.

## 1.2. NETEWEPERWERÎ Û NASNAMEYA NETEWEYÎ

Netewepwerwerî di avakirina neteweyê de yek ji bandorkerên esasî ye. Li gora Ernest Gellner, neteweperwerî çalakiya keşfkirina çandeke kevn e. Û divê gel vegere çanda xwe ya borî û ji wê çanda kevnare û dewlemend, hişekî netewperwer ava bike.[6] Têgeha netewperweriyê piştî şoreşa Fransayê derketiye hole. Neteweperwerî, "netewe", "nasnameya neteweyî" ev têgîn her çiqasî di serdema modern de peyda bûbin jî ew bi serdema berî modernizmê ve jî têkildar in.[7] Li gora Anthony D. Smith, neteweperwerî bi qasî ku nêzîkî "giyanê serdemê" ye, ewqasî bi sembol û keresteyên kevin ve jî girêdayî ye.[8]

Di çarçoveya van agahîyan de heger em hinekî jî li ser nasnameya neteweyî bisekinin, nasname bi qasî ku di bin karîgeriya têkiliya neteweperwerî û dewletê de dimîne, bandorekê jî li wan dike. Pênasekirina vê têgehê bi rastî jî zahmet e lê bi kinasî netewperwerî sîstemek e ku bi gel re hesta 'em'ê peyda dike û yên ne ji xwe jî wek 'yên din' bi nav dike. Gregory Jusdanis wexta ku qala netewperweriyê û edebiyatê dike, giringiya edebiyatê û berhemên kanonîk wisa rave dike:

> Kanona edebiyatê, wek ji hemû çîrokên wî gelî pêk hatî, dibe sedem ku mirov xwe hemwelatiyên gelekî hevgirtî hîs bikin û alîkariya hev bikin. Lê kanon, tenê

[5] E. J. Hobsbawm, *Nations and Nationalism Since 1780*, Cambridge University Press, Cambridge, 1990, r.77-78
[6] E. Gellner, *Nations and Nationalism*, Oxford University Press, Oxford, 1983, r. 48-49
[7] http://www.sametkoseoglu.com/ulus-milliyetcilik-ve-ulusal-kimlik-kavramlari/, Dema gihîştinê:22.01.2018
[8] A. D. Smith, *'Milliyetçilik ve Kültürel Kimlik', Türkiye Günlüğü*, Adar-Nîsan, 1998, r. 76.

> nasnameya neteweyî temsîl nake, ew di heman katê de neteweperwerîyê bi gel dide hezkirin û dibe kirdeyê avakirina netewperweriyê jî. Kanon dîroka –zimanê zikmakî-gel tomar dike; domdariyek kronolojîk ava dike ku endamên cemeatê bi saya vê domdariyê pirsgirêkên ‘niha’ bi hêsanî çareser dikin.[9]

Jixwe girîngiya çanda edebî jî ji vir tê. Wexta ku edebiyat dikeve bin hukma netewperweriyê, dibe sedem ku ax, çîrok û dîroka wî gelî bi wan şêrîn bibe. Yekem rola edebiyatê ya li ser netewperweriyê ev e: Edebiyat divê çîrokeke nû ava bike, paşê jî vê çîroka tekakesî û herêmî, bi çîrokên netewî ve girê bide û têkiliyeke xwezayî di navbera wan de ava bike.

[9] Gregory Jusdanis, hbr, r. 79

# BEŞA DUYEM

# EHMEDÊ XANÎ Û MEM Û ZÎN

## 2.1. EHMEDÊ XANÎ

Li gorî lêkolînan ji ber nasnava 'Xanî' cihê jidayikbûna Ehmedê Xanî baş nehatiye piştrastkirin.[10] Li gora hin lêkolîneran ji ber navê êşîra wî 'Eşîra Xaniyan', bi vî navî hatiye nasîn. Ji ber ku gora wî li Bazîdê ye gelek lêkolîner dibêjin Xanî li Bazîde çêbûye û ji eşîra Xanîyan ya nêzîkî Bazîdê ye. Navê bavê wî Mele İlyas e û alimê medreseyê ye. Û navê dêya wî jî Gulnîgar Xanim e.[11] Piştî mirina bavê xwe perwerdahiya xwe li ba kekê xwe Qasim didomîne. Di sala 1661 ê de dihere Bêgirê (Mûradiye) û xwendina xwe li wir dewam dike. Piştî medreseya Gulgûnê ji bo pêşvebirina ilmê xwe, dihere Bexda û Misirê, paşê jî ji bo wezîfeya xwe ya hecê bi cih bîne, dihere Hicazê. Axir li Xoşabê, ji Medreseya Ataiyyeyê ji destê seydayê xwe Mele Camî îcazetê digire. Paşê vedigere Bazîdê û li wir medreseyekê ava dike. Li medreseya wî zimanê mecbûrî kurdî bû lê bi zimanê farisî, erebî û bi tirkiya osmanî jî ders dihatin dayîn. Li gora Succadî mejûya mirina Xanî nayê tekez kirin. Di hin çavkaniyan de wek sala 1707, di hinan de jî wek 1708 hatiye nivîsîn.

Xanî wek alim û şexsekî mutesewif, hemû berhemên xwe bi kurdî nivîsîne. *Nûbihara Biçûkan* Ferhenga Erebî-Kurdî ye û yekem pirtûka pedagojîk e ku ji bo zarokên kurd hatiye amadekirin. Di sala 1683 an de hatiye nivîsîn. *Eqîdeya Îmanê*, manzûmeyek e ku hin mijarên dînî û eqîdeyî ji bo perwerdehiya xwendekarên medereseyê hatiye sazkirin. Li dora 70 beytî ye. Di sala 1687 an de hatiye nivîsîn. Ji bilî van berheman dîwaneke wî û mesnewiya *Mem û Zîn* jî heye.

---

[10] Îzeddîn Mustafa Resûl, *Şa'irûn, Mufekkirûn ve Feylesûfen ve Metesevvîfen*, Bexda, 1979, r. 28.
[11] Alaedîîn Succadî, *Tarîhu'l Edebî-Kurdî*, Bexda, 1952, r. 192.

## 2.2. DESTPÊKA MEM Û ZÎNÊ

Sarnameyê name, name Ellah
Bê name wî netemam e wellah

Ey metleê[12] husnê[13] ‘işqebazî
Mehbûbê heqîqî û mecazî

Namê te ye lewhê nameya ‘işq
Îsmê te ye neqşê xameya[14] ‘işq

Bê neqşê te, neqşê xame xam e
Bê namê te, name ne temam e

Namê te ye şahebeytê meqsûd
Fihristê mukatebatê[15] mehmûd

Mezmûnê muraselatê lareyb[16]
Meşhûdê mukaşefatê[17] bi-l- xeyb[18]

Mehbûb û qulûbe men lehû l-qelb[19]
Qelban tu dikî bi bal xwe ve celb[20]

Me’şûq-i û tu yî, bi fexr[21] û naz î
‘Aşiq tu yî, lêk-i bê niyaz î

---

[12] Destpêker. Ji bo zimanê îro xebata Ehmedê Xanî, *Hemû Berhem,* (ed: Kawa Nemir), Weşanên Lîs, İstanbul hatiye bikaranîn.
[13] Rindî.
[14] Pênûs, qelem.
[15] Sînedefter.
[16] Naverok.
[17] Jêdiyarbûn.
[18] Ji nepeniye.
[19] Xwedî dil.
[20] Gazî, kişandin.
[21] Pesn

Mutleq tu mufîd[22] û mustefad î
Bê şubhe murîd û he mirad î

## 2.3. MEM Û ZÎN

Mem û Zîn çîrokeke evînê ye.Çawa ku mesnewîyên klasîk yên wek *Xusrew û Şîrîn, Leyl û Mecnûn, Yusuf û Zuleyxa* ji arezûyên gelê xwe peyda bûne, *Mem û Zîn* jî ji arezû, hêst û hizrên kurdan peyda bûye. Mesnewiya *Mem û Zîn* ji destana Memê Alan sûdwergirtiye û ji aliyê Ehmedê Xanî ve hatiye nivîsîn. *Mem û Zîn*a Xanî mesnewî ye lê çavkaniya wê destaneke devkî ye ku di nav gel de hê jî berbelav e. Xanî di *Mem û Zîn*ê de jêdera mesnewiya xwe wiha rave dike:

Şerha xemê bikim fesane
Zînê û Memê bikbim behane

Nexmê we ji perdeyê derînim
Zinê û Memê ji nû vejînim[23]

Li gora Martin van Bruinessen berhema Xanî ji aliyê guhdarên destana Memê Alan ve jixwe ew ê nehata famkirin, xwînerê vê berhemê elît bûn. Ya di serayan de bûn yan jî dewlemend û xwendeyê medreseyan bûn. Bruinessen dibêje tevî nusxeyên koleksîyona Jaba û yên li Ewropayê herî pir 40- 50 nushayên vê mesnewîyê hebûn, her yek ji wan ji aliyê bîst kesan ve hatibe xwendin jî encax bike hezar an jî du hezar kes. Hasil li gora wî piştî ku berhem li metbaayê çap dibe, xwe digihîne xwînerên xwe yên resen an jî gel.

*Mem û Zîn,* di pêvajoya avakirina netewperweriya kurdî de metneke kanonîk e. Tu neteweperewerê kurd nemaye ku di hest û ramanên xwe yên neteweperwerî de ji vê mesnewîyê îlham negirtibe. Her çiqas mesnewî ji aliyê naverokê ve li ser mijareke evînî hatibe avakirin jî, bi taybetî di beşa destpêkê de diyardeyên ku Xanî vedibêje, nîşaneyên hizra netewî tîne bîra me. Mînak kesên wek Cemal Nebez, Amir

[22] Fêdekar
[23] Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, (wer. Mehmet Kaplan), Nûbihar, 2014, İstanbul, r. 69, 70.

Hasanpour, Ferhat Şakelî van nîşeyên netewperweriyê, di mesnewîya Xanî de li gora nerîneke îroyîn, şîrove dikin. Kesên navborî, hewl didin piştrast bikin ku Xanî, ev metn ne ji bo du evîndarên ciwan, lê ji bo alegoriya arezûyek tifaqa kurdan û serokekî kurd ku yekîtiyekê pêk bîne, nivîsiye. Xanî di mesnewiya xwe de vê yekê rasterast tîne zimên:

Ger dê hebûya me padişahek
Laiq bidiya Xwedê kuahek

Ta'yîn bibûya ji bo wî textek
Zahir vedibû ji bo me bextek

Hasil bibûya ji bowî tacek
Helbet dibû ji bo me jî rewacek[24]

Bi vê egerê mirov dikare bi hêsanî bibêje ku Xanî yekem hîmdanerê netwperweriya kurdî ye.[25] Lê ji vê gotinê qesta me ne netewperweriyeke şoven e. Ji ber ku mirov nikare di tu ristên *Mem û Zîn*ê de nîşaneyek bi vî rengî bibîne. Di sedsala 17 emîn de Bazîd di nav xaka Dewleta Osmanî de dihat hesêb û zimanê fermî tirkiya osmanî bû. Farisî wê demê zimanekî belîx û edebî bû û zîmanê dêrîn erebî, zimanê dînî bû ku têsîra xwe li hemû zimanên derdora xwe dikir. Rewşenbîr û alimên berî Xanî, berhemên xwe ya bi farisî yan jî bi erebî dinivîsîn, wek mînak Şerefxanê Bidlîsî[26] *Şerefxaneya* xwe, cardin wek sîyasetmedar û alim İdrîse Bidlîsî[27] berhemên xwe bi farisî nivîsîne. Xanî tevî ku ev her sê zimanên navborî wek zimanê xwe yê zikmakî zanîbû jî, wî wek tercih mesnewîya xwe, bi kurdî nivîsî. Divê neteweperweriya Xanî di vê çarçoveyê de bê pênasekirin. Rênas Jiyan sedema kurdînivîsîna Xanî wisa rave dike:

[24] Ehmedê Xanî, Hemû Berhem, Lîs, 2008, r. 38

[25] Ferhad Şakelî, *Mem û Zîn'de Kürt Milliyetçiliği*, (wer :Ş.Süer), İstanbul, 1996, r. 8
[26] Şerefxanê bidlîsî di sedala şazdemîn de jiyaye. *Nivîskarê Şerefname*yê ye. (farisî)
[27] İdrîsî Bîdlîsî, di sedsala 15 emîn de li Seraya Osmanî wek katibê fermî xebitiye. Di pêkanîna tifaqa mîrtiyên Kurd û Osmanî de roleke mezin lîstiye.

Xanî, “Mem û Zîn” bi armanca ku li hemberî serdestan hebûna zimanê kurdî bipeyitîne (ispat bike) nivîsîye. Teleolojiya Xanî têgeheke netewperwer e, ji bo ku ew vê teleolojiyê vebêje alavek jê re lazim e û wek mîtosa kurd ji Mem û Zînê çêtir tu alav nîn e; ji ber vê sedemê Xanî, “Mem û Zîn” nivîsiye. Di “întertekstuwalîte”ya “Mem û Zîn”ê de armanca Xanî ontoloji ye; “Mem û Zîn” projeyeke ontîk e, referansa wê ya kûr “hebûn” e, peyitandana hebûna qewmê kurd e. Xanî bi “Mem û Zîn”ê ji serdestên kurdan re vê dibêje: ”*Em hene û em di etîk û estetîkê de ne kêmî we ne. Ger hûn li delîlan dipirsin, kerem bikin vaye Mem û Zîn*!” [28]

Xanî di mesnewiya xwe de van gotinên Rênas Jiyan piştrast dike:

Da xelq-î nebêjitin ku Ekrad
Bê Me’rrifet in bê ‘esl û bunyad.

Enwa’e mille[i]l xwedankitêb in
Kurmanc-i tenê bê hesêb in. [29]

Xanî ne yekem helbestkarê kurdînûs e. Berî wî nivîskarên gelekî giring hene. Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran berî wî ne û berhemên wan gihiştine destê me. Xanî di mesnewîya xwe de wisa qala wan dike:

Bîna vê rûha Melê Cizîrî
Pê hey bikira ‘Elî Herîrî

Keyfek wê bida Feqiyê Teyran
Hetta bi ebed bamayî heyran. [30]

Gelo edebiyata Kurdî tevî ku berî Xanî jî helbestkarên gewre hebûn çawa bi pêş ve neçûbû, Martin van Bruinessen di gotarake xwe de bersiva vê yekê wisa dide:

[28] Rênas Jiyan, “Şêx Evdirehmanê Axtepî”, *Çirûsk,* H. 19*, r.* 77.
[29] Ehmedê Xanî, *Hemû Berhem*, Lîs, 2008, r.41
[30] Ehmedê Xanî, *Hemû Berhem*, Lîs, 2008, r. 42

Helbet bersivên vê pirsê ne hêsan in, lê ew ê tekiliya wê bi serdestiya Osmanî re hebe ku Xanî her aciziya xwe ya li hember vê yekê tîne zimên. Li İstanbulê piştî sedsala şazdemîn, li serayê ji dêleva zimanê farisî hêdî hêdî tirkiya Osmanî dihat emilandin. Ev yek bûye sebep ku helbestkarên mîna Cizîrî û Xanî, berhemên xwe bi zimanê xwe binivîsin.[31]

Xanî fikrên xwe yên li ser kurdan sê sed sal berê gotiye lê gotinên wî yên wê demê hê jî bi nirx e û domdar in. Wek cihekî erdnîgarî kKurdistan ji aliyê du imperetoriyên xurt ve -Osmanî û Sefewî- hatibû parçekirin, rewşa welêt, kurd aciz dikir. Mebesta wî, ew bû ku di *Mem û Zîn* de behsa êş û azarên gêl, parçekirina welêt û qala bêdewletbûna xwe bike. Kurd ji aliyê ziman û çandê ve şûnde mane û divê demildest di navbera wan de têkiliyeke xurt bê avakirin:

Ger dê hebûwa me îtifaqek
Vêk ra bikira me înqiyadek

Rom û Ereb û ‘Ecem temamî
Hem’yan ji me ra dikir xulamî

Tekmîl-i dikir me dîn û dewlet
Tehsîl-i dikir me îlm û hikmet[32]

Xanî ji kurdbûna xwe serbilind bû, ew jî bi qasî serdestên xwe xwedî hêz bûn. Tevî hemû bûyerên pêkhatî, wî welatê xwe ne wek parçebûyî wek dagirkirî didît.. Ew alimek bû li gora wî tekane xelasiya welêt ne tenê bi şûr û mertal bûn. Xwediyek, xwedanek pêwîst bû ji kurdan re, xwedanekî qîmetê ziman, çand û henerê jî zanibe ku gelê wî, ji tariyê ber bi ronahîyê ve bibe.

[31] Martin van Bruinessen, hbr,r. 66

[32] Ehmedê Xanî, *Hemû Berhem*, Lîs, 2008, r. 42

Ger dê hebûya me jî xwedanek
‘Alîkeremek, letîfedanek

‘İlm û huner û kemal û îza’n
Şiî’r û xezel û kîtab û dîwan

Ev cins biba li ba wî me’mûl
Ev neqd biba li nik wî meqbûl

Min dê ‘elema kelamê mewzûn
‘Alî bikira li banê gerdûn

# ENCAM

Di sedsala 16 emîn û 17 emîn de li Kurdistanê gelek bûyerên qewimîn ku rasterast têsîr li ser civaka kurdan kirin. Wê demê ji ber bêtifaqîya kurdan welat parçe bû. Tevî vê bûyera acizker jî di vê sedsalê de ji aliyê çand û perwerdehiyê gelek pêşketin çêbûbûn. Bi dehan kesên mîna Melayê Bateyî, Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran di dezgeha medreseyên kurdan de bûn alimên gewre û asasê wêjeya me ya nivîskî danîn. Vê ya taybetiyeke giring bû: Ji ber ku di van sedsalên navborî de civaka Kurdan bi gelemperî wek girseyeke eşîrî, koçber, çiyayî bûn. Eşîrtî û koçberî ji bo çand, ziman û wêjeya devkî di nav gelekî de belav bibe pir muhîm e. Lê

ew civaka xwe wek kurd bi nav dike, li ser erdnîgariyeke berfireh ji aliyê çand, devok, zareva û çandê ve gelekî ji hev cuda bû. Em vê cudahiyê hê jî gelekî şênber li ber çavan dibînin, ji ber ku hê jî wisa ye lê me ev yek du sesed sal berê jî, ji nivîs û berhemên wê demê de jî dibînin.

Xanî bi gelek aliyên xwe ve ji dîrok û wêjeya kurdan re xizmet kiriye lê ji aliyê neteweperweriyê ve ew bêhempa ye. Di warê wêjeya nivîskî de wî şahberhemek di asta serdestên xwe de nivîsîye ku ev yek ji bo ispatkirina gewrebûna zimanê kurdî nimûne û hewldaneke şênber û binirx e.

Di warê netewperweriyê de ew bi awayekî dibêje ku divê kurd çarenûs û siberoja xwe bi xwe tayîn bikin. Ew di şahberhema xwe de bi awayeke eşkere qala giringiya azadiyê dike û dibêje kurd divê xwedî erkekê bin. Ji bo vê yekê jî wek reçete xurtbûn, yekitî û zanîn lazim e.

Kurd li her çar aliyê welatê xwe û li derveyî welêt nêzî çel mîlyon kes in. Eger îro kurd bûbin neteweyek, ev serkeftin bi saya hizra netewperweriyê ye. Min di vê xebatê de xwest piştrast bikim ku hîmdanerê netewepewerweriya kurdî Xanî ye û di netewperweriya wî de şovenîzm tuneye. Wî di hemû ewreyên netewperweriya kurdî de roleke girîng lîstiye. Û hewl daye ku zimanê xwe derxe asta zimanên serdestên xwe.

# ÇAVKANÎ

Amir Hassanpour, *Kürdistan'da Dil ve Milliyetçilik*, (Wer: İbrahim Bingöl, Cemil Gündoğan), Avesta Yayınları, İstanbul, 2005.

Martin van Bruinessen, 'Ehmedê Xanî'nin Mem û Zîn'i ve Kürt Milli Uyanişinin Ortaya Çıkışındaki Rolü', *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri*, (amd: Abbas Vali,), Avesta Yayınları, İstanbul, 2005

Jean Luca, *Uluslar ve Milliyetçilikler*, (wer: Siren İdemen), Metis Yayınları, İstanbul, 1998.

Benedict Anderson, *Hayal*î Cemaatler, (wer: İslender Savaşir), Metis Yayınları, İstanbul, 2015.

Gregory Jusdanis, Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür, (wer: Tuncay Birkan), Metis Yayınları, İstanbul, 2015.

A.M. Alonso, *The efects of the truth: Re- Presentetion of the Past and the İmagining of Cominity*, Cambridge, 1988.

E. Gellner, *Nations and Nationalism,* Oxford University Press, Oxford, 1983.

http://www.sametkoseoglu.com/ulus-milliyetcilik-ve-ulusal-kimlik-kavramlari/, Dema gihîştinê: 22.01.2018

A. D. Smith, '*Milliyetçilik ve Kültürel Kimlik'*, *Türkiye Günlüğü,* Adar -Nîsan, 1998.

Tayyar Ari, *Uluslararası İlişkiler ve Dış Politika,* Marmara Kitap Merkezi, Bursa, 2009.

E. J. Hobsbawm, *Nations and Nationalism Since 1780*, Cambridge University Press, Cambridge, 1990.

Konstantinos Parnassos , *Antolojiya Helbestên Bijarte ji Yewnanîstana Nûçêbûyî*, 1845

Ferhad Şakelî, *Mem û Zîn'de Kürt Milliyetçiliği*, (wer: Ş.Sûer), İstanbul, 1996.

Îzeddîn Mustafa Resûl, *Şa'irûn, Mufekkirûn ve Feylesûfen ve Metesevvîfen*, Bexda, 1979.

Alaedîîn Succadî, *Tarîhu'l Edebî-Kurdî*, Bexda 1952.

Ehmedî Xanî, *Mem û Zîn,* (amd: Kadri Yıldırım), Avesta Yayınları, İstanbul, 2010.
Ehmedê Xanî, Hemû Berhem, Lîs, 2008.
Rênas Jiyan, "Şêx Evdirehmanê Axtepî",*Çirûsk*, hejmar 19, 2013.

T.C

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Tezsiz Yüksek Lisans Projesi

# EHMEDÊ XANÎ’NİN *MEM Û ZÎN* ADLI MESNEVİSİNDE MİLLİYETÇİLİK


Halil ABDÜLSEMETOĞLU

13721076


Danışman

Yard. Doç. Dr. Necat KESKİN

Mardin 2018

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller

Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Tezsiz Yüksek Lisans Projesi

# EHMEDÊ XANÎ’NİN *MEM Û ZÎN* ADLI MESNEVİSİNDE MİLLİYETÇİLİK

Halil ABDÜLSEMETOĞLU

13721076

Danışman

Yard. Doç. Dr. Necat KESKİN

Mardin 2018